Li Şam – Munteda Nûredîn Zaza

Di 14.10.2006an de , li Şam , Munteda Nûredîn Zaza , bi beşdariya gelek siyasetvan û rewşenbîrên Kurd , Ereb û Aşûr Xelata Dr.N.Z pêşkêşî pênc kesên navdar û xwedî rol dike . Kesên hatine xelatkirin ev in :

1- Mamoste **Isme'îl Umer**, serokê partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê .
2- Rewşenbîr û rikberê Sûrî, **Mamoste Ekrem Bunî** .
3- Rewşenbîr û rikberê Sûrî yê zîndankirî , Mamoste **Mîşêl Kêlo** .
4- Berpirsiyarê rikxirawa Aşûrî , Birêz **Gibra'îl Mûşê** .
5- Helbestvanê Kurd, ê bi nav û deng , **Yûsêf Berazî** .

Gotinên di wê şevê de , hatine xwendin evên jêrîn in :

1-Gotina ji ber **Mîşêl Kêlo** ve .
2- Gotina **Ekrem Bunî** .
3-Gotina **Gibra'îl Mûşê**.
4- Gotina **Isma'îl Umer**
5- Çend helbest , ji aliya **Yûsêf Berazî** ve(Bêbuhar) .
6-Gotina **Hemît Hec Derwîş** sekreterê partiya pêşverû ya Kurd li Sûriyê .
7- Gotina Mamoste **Nesredîn Ibrahîm** sekretêrê partiya Elpartî ya di Hevbend de .
8- Gotina bi navê Munteda Etasî ya elhîwar eldîmoqratî , li Sûriyê .
9- Gotina **Welîd Bunî** ya bi navê Buhara Şam .
10- Gotina Nivîskarê hêja , mamoste **Cemal Eclûnî** .
11- Gotina Mamosteyê Kurd **Ebdilîlah Ibrahîm Paşa Milî** .
12-Birûska ji bal helbestvan **Ferhad**.

Îçmo ve hatî
13- Gotina mamoste **Mihemed Ceza'î** (bavê Koşkîn) .
14- Gotina rojnama **Newrozê** .
15-Gotina partiya Elwîfaq Eldîmoqratî (Rêkeftin) .
16- Gotina rewşenbîrê ciwan , Heval Yûsêf Neyo .
17- Gotina toreyî ya helbestvan Can baoîr .

Hêjayî gotinê ye ku , em bibêjin , ev boneya , ne tenê ya xelatkirinê bû û hew . Lê belê , bû boneyeke guftogo û hevenasîna Kurd , Ereb û Aşûran jî . Û cara yekê ye , ku rewşenbîr û rikberekî Ereb mîna mamoste Cemal Eclûnî:Bi zarzimanekî aşkere, ji hevnetewa xwe , lêborînê ji gelê Kurd hêvî dike û bi taybetî ji serok û qeralan doz dike , ku şopa wî bigirin , dev ji nijadperestî û şovenîzmê berdin û biratiya gelên pê re dijîn bigirin .

Em jî , ji aliyê xwe ve , wek komîta birêvebirina **weşana Newroz** , sipasiya komîta birêvebirina Munteda Nûredîn Zaza dikin û hertim , em ji ton karên weha re piştgir in.

Vaye li jêr , emê gotina Newrozê biweşînin :

Bila ev boneya bibe boneya
Wergirtina kelk û sûdan

- Rêz û silav , ji komîta birêvebirina Munteda Çandeyî ya Nûredîn Zaza re
- Rêz û silav, ji beşdarên vê şevê re.

-Ciwantirîn rêz û silav, ji giyana nemir **Nûredîn Zaza** re. ⟶